
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1109 | 18-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Xelata Fîzîkê ya Nobelê hat dayîn




Xelata Fîzîkê ya Nobelê îsal dan wan lêkolîneran ku navgînên nû peyda kirine ji bo keşfkitina cîhana elektronên di nava atomê û molekulan de.

Pîere Agostînî yê Fransî, Anne L'Hûîllîera Fransî-Swêdî û Ferenc Kraûsz ê Awûstûrya-Macaristanî, ji ber xebata xwe ya li ser tevgera elektronan di nava atom û molekulan de, liyaqê Xelata Fizîkê ya Nobelê hatin dîtin.

Li gor jûriyê, zanyar, ji ber çêkirina derbeyên roniyê yên pir kin ku mirov bikare pêvajoya bi lez a elektron tev digerin û ya jî enerjiyê diguherînin, bipîve bi kar bîne, hatin xelatkirin.

Anne L'Hûîllîer û Ferenc Kraûsz, Paûl Corkûmê Kanadayî sala 2022'yan jî bi hev re Xelata Wolfê ya bi prestîj wergirt.

Roja 2'yê Cotmehê Xelata Tibê ya Nobelê dan Katalîn Karîko ya Macar û Drew Weîssmanê Emerîkayê ku bi dîtina derziyên RNA'yê kiriye ku derziya Covîd-19'ê jî bê dîtin.

# Bandora qirêjahiya ji ber şewatê li ser welatên xizan bêhtir e



Li gor lêkolînekê ku di kovara Nature de hat weşandin, bandora qirêjahiya hewayê ya ji ber agirê bi daristanan dikeve li ser welatên xizan bêhtir e.

Li gor lêkolînekê ku roja Çarşemiyê hat weşandin, parzemîna Efrîkayê ye ku herî pir bandora qirêjahiyê li ser çê bûye, ji ber agirê salên 2010-2019'an bi daristan û cihan ketiye, her sal 35 roj û nîv partîkulan bi zirar çêdibin.

Lêkolîneran ji bo partîkulerên navbera salên 2000- 2019'an ên ji ber qirêjahiya agir bipîvin û nirxandina konsantrasyonên ozonê bikin jîriya çêkirî û teknîka modelkirina kompîturê bi kar anîne.

Li gor vedîtinên ku bi dest xistine, welatên ku bandora qirêjahiya ji ber agir li ser wan çê bûye; Angola, Komara Kongo ya Demokratîk, Zambiya, Kongo-Brazavîlle û Gabon e.


Piştî Efrîkaya Navîn welatên salên 2000 – 2019'an ji ber qirêjahiya ji ber şewatê herî pir bandor li ser wan çê bûye Başûrêrojhilatê Asyayê, Başûrê Emerîkayê û Sîbîrya ye.

Li gor lêkolînê qirêjahiya ji ber agir li gor deh salên beriya 2010-2019'an ji sedî heft zêde bûye.

Herwiha li gor standardên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) gelek bajarên welatên dewlemend pir qirêj in.

Li gor raporê sedem trajîk, germkirin û fabrîka ne.

# Xelata Kîmyayê ya Nobelê ji karên kûantûmê re hate dayin




Xelata Kîmyayê ya Nobelê îsal ji sê lêkolînerên DYE'yî re hate dayin, ji ber karê xwe yê keşifkirin û senteza nuqteyên kûantûmê.

Ji Enstîtuya Teknolojiyê ya Massachûsettsê Moûngî Bawendî, ji Zanîngeha Colûmbîayê Loûîs Brûs û ji Nanocrystals Technology Alexeî Ekîmov hêjayî xelatê hatin dîtin.

Hersê lêkolîn ji ber karê xwe yê li ser keşif û senteza nuqteyên kûantûmê hêjayî xelatê hatin dîtin.

Jûriya Nobelê ji bo keşfa lêkolînerên Emerîkî got,"Keşfeke bingehîn a li nanoteknolojiyê ye."

# Helebceyî êşên gelê xwe bi rêya hunerê nîşanî cîhanê dide



Bextiyar Helebceyî hûnermendekê şêwekar û peykersaze ku êşên gelê xwe bi rêya hûnera xwe de nîşan dide. Hunermendek ku bi şiyana xwe ya hûnerî, bûyerên bi êş yên gelê xwe bi çêkirina peykeran cûr bi cûr nîşan dide. Helebceyî bi salane şaheserên xwe li saloneke sade ya Kargeha Çanda ya Silêmanî nîşan dide.

Helebceyî şêwekar û peykersazek yê Başûrê Kurdistanê ye. Demeke dirêje bi peykersaziyê helwestên mirovî û netewî bi awayê peyker çêdike. Pirsgirêkên jinan, êş û neheqiyên civakî yên rojane, parçeyek ji xebatên wî ne.

Bextiyar Helebceyî wênesaz û peykersazekê Kurde ku di sala 1970'yan de li bajarê Helebce yê Başûrê Kurdistanê ji dayik bûye. Ji zarokatiya xwe ve meraqa wî bi hunerê re hebû, paşê pê hesiya ku şiyanên wî di peykersaziyê de ne ku ev jî bû sedem ku dest û tiliyên xwe bi hûnera peykersaziyê rehet bike. Helebceyî derbarê xebatên xwe yên hûnerî de dibêje ku hûner çekeke ku ew di derbarê mijarên dîrokî û rojane de xeyalên xwe pê îfade dike. Kîmyabarana Helebçe, Enfal û qirkirin û komkujiya hîn li ser gelê Kurd yê her çar parçeyên Kurdistanê ya ji aliyê rejîmên dagirker ve berdewame, bi rêya çêkirina tablo, seramîk û peykeran, birînên kûr yên bi hezaran salin di dilê Kurdan de hene, nîşan dide.

Helebceyî, dibêje ku her çendî ku wî nikarîbû xwendina xwe ya akademîk di warê hûnerî de biqedîne, lê ew nebûye asteng li pêşiya wî ji bo bidestxistina hobîyên xwe û di asteke baş de şiyanên xwe di vî warî de pêşxistiye.

Herwisa da zanîn ku wî xwe ji êşên gelê xwe re veneqetandiye û hewl daye bi çeka hûnerî deng, reng û êşên gelê Kurdê bindest bigihîne cîhanê.

Helebceyî eşkere kir ku peyker xwedî bedewî û estetîka xwe ya taybete ku her mirovek li gorî şiyanên xwe yên hûnerî berhem didin, got; "Ez ne bi rêya dibistan, zanîngeh an perwerdeyeke akademîk fêrî vî karî bûme. Min tim hewl daye ku xeyalên xwe bi azadî îfade bikim."

Di dawiyê de hûnermendê şêwekar û peykersaz Bextiyar Helebceyî diyar kir ku xebitîna li salona ku ew têde dixebite bûye sedem ku ew hest bi aramiyeke xwezayî bike û wiha dawî li gotinên xwe anî; "Her wekî ev salona ez lê xebatên xwe yên hûnerî dikim, tenê ew dikare min ji hemû gengeşe, alozî û qerebalixa siyasî dûr bixe. Ji min re weke biheştekê ye ku têde bi asodeyî têde bêhnê bidim û bistînim.

Sudoku: Bersiv 20

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 8 | 9 | 7 | 2 | 4 | 5 | 1 | 6 |
| 1 | 2 | 5 | 6 | 8 | 9 | 7 | 4 | 3 |
| 4 | 6 | 7 | 1 | 3 | 5 | 2 | 8 | 9 |
| 7 | 5 | 4 | 8 | 9 | 3 | 1 | 6 | 2 |
| 8 | 9 | 1 | 5 | 6 | 2 | 4 | 3 | 7 |
| 6 | 3 | 2 | 4 | 7 | 1 | 8 | 9 | 5 |
| 5 | 7 | 6 | 9 | 1 | 8 | 3 | 2 | 4 |
| 2 | 4 | 8 | 3 | 5 | 6 | 9 | 7 | 1 |
| 9 | 1 | 3 | 2 | 4 | 7 | 6 | 5 | 8 |

Sudoku:Pirs 21

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | | | | | 3 | | 4 |
| | | | | | 8 | 2 | 7 | |
| 6 | 5 | | | | | 1 | | |
| | | 1 | 9 | 8 | | | | 6 |
| 9 | | | | 4 | | | | 1 |
| 7 | | | | 3 | 2 | 8 | | |
| | | 9 | | | | | 4 | 7 |
| | 7 | 6 | 4 | | | | | |
| 2 | | 5 | | | | | 1 | 3 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kuçikên wî avêtin:**
- Qewitandin; qewirandin; berdanê; derxistin.

**Mêş hatiyê:**
- Hêrs bûye; tore bûye; pir xeyidiye.

**Mêşika wî heye:**
- Zû hêrs dibe.

**Min xwîn bi xwe ve dît:**
- Ez pir hêrs bûm.

**Mirov newêre ber siha wî re bibore:**
- Cira wî pir ne xweş e; pir bêhnteng e; pir zû hêrs dibe; ji bo ku şer bike li behaneyan digere.

**Mirîşk hêkan dike birh bi dîk dikeve:**
- Yek zehmetiyê dikişîne yê din tengav dibe, hêrs dibe.

**Navê wî nayne ser zimanê xwe:**
- Pir jê hêrs bûye.

**Pozê xwe bilind kir:**
- Hêrs bû; pir xeyidî.

**Qiyamet li serê me rabû/qiyamet li serê me rakir:**
- Pir hêrs bû.

**Rabû ser hêl û pepanan:**
- Dîn bû; har bû; xwe neqayîl kir; xwe hêrs kir.

**Rahişt şûrê xwe û derket meydanê:**
- Pir hêrs bû; har bû; êrîşî derdorên xwe kir; xwest şerê hina bike.

**Rayên mêraniyê li eniya wî rabûn:**
- Pir hêrs bû.

**Rûn di dest de be, rûdike (diavêje) te:**
- Pir bikîn e; pir zû hêrs dibe; dema hêrs dibe tiştek nayê bîrê, dikare her tiştî bike.

**Şoravka kêmav (pir şor) dîzikê diderizîne:**
- Kesê pir hişk, kesê pir bihêrs di dawiyê de zererê dide xwe.

**Şûrê xwe tûj kiriye:**
- Hêrs bûye; dijwar bûye; har bûye; pir xeyidiye.

**Textê min gelek mixan hilnade:**
- Min hêrs nekin; êdî ez nikarim xwe ragirim.

**Textikên min li hev ketin:**
- Ez dîn û har bûm.

**Tif di devê min de ziwa bû:**
-Ez pir hêrs bûm; ez pir aciz bûm; ez bêzar bûm.

**Tijî bûye:**
- Pir hêrs bûye; hindik maye ku biteqe.

Xezalê ji ber şkêvlatokê (kîso, kûsî) **zozan li xwe heram kir:**
- Ji ber ku ew jî xwe tîne qama yên ser xwe re yên ser re pir hêrs dibin.

**Xwe xwar:**
- Pir hêrs bû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# 'Êrişên dagirkeriyê berdewamiya Komploya Navneteweyî ye'

Dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê didomîn e. Endama Kordînasiyona Kongra Star ya Kantona Qamişlo Ibtîsam Hisên diyar kir ku armanca hedefgirtina binesaziya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, qirkirina gelên herêmê ye.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1109 | 18-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# AZADÎ JI ABDULLAH OCALAN RE ÇARESERIYA SIYASÎ JI PIRSGIRÊKA KURD RE

Pêngava 'Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re' ku di 10'ê Cotmehê de hatibû destpêkirin, li tevahiya cîhanê deng veda û çalakiyên wê berdewam in. Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî tevlî pêngavê bûn.**R-3**



## 'Berxwedana gelan planên dijmin têk birin'




Endamê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) Mustefa Ebdo diyar kir ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bi êrêkirina hêzên navneteweyî yên pêk tê û got, berxwedan û têkoşaîna gelan planên dagirkeriya Tirk têk birin.**R-7**

## QSD'ê hêviya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye

Di 10`ê Cotmeha sala 2015'an de Hêzên Sûriya Demokratêk hate damezrandin. Bi dirêjiya 9 salan QSD'ê gelek serkeftin û guhertinên mezin di qada leşkerî û siyasî de pêkanîn. QSD'ê hîn li ser soza xwe ye û ew ji bona gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê hêviya siberojê ye.**R-5**

## 'Dagirkeriya Tirk têkbirina vîna nifşên siberojê dike armanc'



Semîra Hac Elî diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker li ber çavên cîhanê sivîl û zarokan dike armanc û tevahiya zagonên mafên mirovan bin pê dike û got, li hemberî sûcên dewleta tirk tevahiya rêxistinên mafê mirovan yên navneteweyî bêdengin û bi erkê xwe yê exalqî ranabin.**R-6**

Şûna koçberiyê em xwe biparêzin — Nehîr pale R-2


Şûjina di çavê xwe de nabîne, derziya di çavê xelkê de dibîne — Dilyar Cizîrî R-4


Dewletparêzî û şerê li Rojhilata Navîn... — Farûk Sakik R-5

Erdogan, Filîstîn û her tişt ji bo desthilata xwe bikaranîn — Zekî Bedran R-5

# ‘Êrîşên dagirkeriyê berdewamiya Komploya Navneteweyî ye’

Dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê didomîn e. Endama Kordînasiyona Kongra Star ya Kantona Qamişlo Ibtîsam Hisên diyar kir ku armanca hedefgirtina binesaziya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, qirkirina gelên herêmê ye.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Di 5’ê Cotmeha 2023’an de dewleta Tirk a dagirker bi belafirên bêmirov yên bi çek û gelek çekên giran êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir, dagirkeriyê di êrişên xwe de bi awayekî rasterast binesaziya herêmê kir armanc û di encamê de gelek sitasyonên elektirîkê, avê û betrolê hatin hedefgirtin û ji xizmetê derketin.
Di derbarê êrîşan endama Kordînasiyona Kongra Star ya Kantona Qamişlo Ibtîsam Hisên ji rojnameya ronahi re axivî.

**Hovîtiya dewleta Tirk li ser Gelê Kurd**

Ibtîsam Hisên diyarkir ku Dewleta Tirk a dagirker bi armanca qirkirina gelê herêmê careke din êrîşî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir wiha got: “Di 2018`an dewleta Tirk bi awayekî hovane Efrîn dagir kir, herwiha piştî wê di 9`ê Cotmehê de êrîşî Serêkanyê û Girêspî jî kir û dagirkir. Dagirkeriyê êrîşên xwe yên li dijî gelan tu carî ranewstandiye. Di sala 2022`an de jî teqînek li Stembolê çêbû û bi bihaneya wê teqînê êrîşeke hovane li ser bakur û rojhilatê Sûriyê pêk anî û hemû bineszaiya civakê ya ku civak li ser jiyan dike kir armanc, îsal jî carek din gelê kurd kir armanca xwe û binesaziya bakur û rojhilatê Sûriyê da ber bomberanan. Armanca dagirkeriya Tirk a sereke têkbirina pirojeya demokratîk ya li Rojava, herwiha pêkanîna plana dagirkirina tevahiya herêmê ye.”

**`Armanca dewleta tirk hilweşandina pirojeya neteweya demoqratîke`**

Ibtîsam Hisên di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Ji 5`ê mehê ve heyanî niha dewleta Tirk bi çekên leşkerî, balefirên bêmirov hedef digre, him binesaziya civakê armanc girtiye da ku gel ji herêmê vala bike û pirojeya neteweya demoqratîk ya ku bi fikir û ramanê Rêber Apo hatî avakirin hilweşîne, ev êrîşên ku dewleta Tirk dike hemû berdewamiya kompiloya navneteweyî ya ku di 9`ê cotmeha 1998`an de destpêkir bi destê dewletên hegemonîk yên ku ji ber berjewendiyên xwe nexşeke nû jêre xêz bikin, komplo li ser Rêber Apo hat pêkanîn û wî dîl bigirtin.”

**` Felsefeya Rêber Apo kilîta çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn e`**

Endama Kordînasiyona Kongra Star ya Kantona Qamişlo Ibtîsam Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Ev 25 salin Rêber Apo di girtîgeha Îmraliyê de ye, tevî şertûmercên zehmet yên ku li tu girtîgehan de nayê pêkanîn, li ser Rêber Apo hemû rêbazên şerê taybet û dûrxistina ji civakê tê bikar anîn, ji ber ku dizanin yek axaftin ji Rêber Apo kilîta çareserkirina pirsgirêka Rojhilata Navîn e, ji ber vê yeke di bin navê cezaya dispilînê de tecrîdê roj bi roj girantir dikin, di hemû zagonên cîhanê de kesek bighe vî temenî di girtîgeha de namîne, lê tevê ku temenê Rêber Apo bûye 73`ê sal hîn di bin tecrîdê deye, lê tevê vê yekê berxwedaniya Rêber Apo misogeriya azadiyê ye, di hizrê wan de gava Rêber Apo were girtin wê gel bê pêşeng bimîne, lê berûvajî vê yekê çêbû , Rêber Apo bi fikir, hizir û felsefeya xwe karî wê girtîgehê bike ekadimî,dibistan û zanîngeh û fikir,hizir û ramanê xwe li seranseî cîhanê belav kir û bandor li hemû gelên azadîxwaz kir.”



# Şêrîn Hesen: Jineolojî Ji Bo Pirsgirêkên Jin Û Civakê Têdikoşe

**Zana Roj/ Şehba**

**Endama Navenda Lêkolînên Jineolojî ya Efrîn û Şehbayê Şêrîn Hesen da zanîn ku Jîneolojî bi keda Şehîdan gihişt vê astê û got, Zanista Jineolojî ji bo çareserkirina pirsgirêkên jin û civakê têkoşîneke mezin dide meşandin.**



Peyva Zanista jineolojî cara yekem ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve di pirtûka ‘Civaknasiya Azadiyê’ de derketiye holê. Têkildarî xebat û lêkolînên jineolojî yên herêma Şehbayê endama Navenda Lêkolînên Jineolojî ya Efrîn û Şehba Şêrîn Hesen bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**1- Di sala 2023’an de xebatên jineolojî bi konfiranseke zanistî hat dest pê kirin, pilansazî û xebatê ku we giranî da ye çi bûn?**

- Bi bûneya Şehadeta Heval Sekîne û vekirina navendê li herêma Şehbayê me konferansek zanistî li dar xist. Konferans li ser esasê nirxandina xebatê jineolojî û rêbazê pêşxistina wê hat li dar xistin. Di konferansê de jin û dostên kevin yên rêxistinê û di şoreşê her wiha endamên saziyan tevlî bûn. Pirsgirêkên di civakê de yek û yek hatin nirxandin her wiha avakirina malbateke demokratîk wê çawa were avakirin hat armanc girtin. Tavahî pirsgirêkên ku di civakê de rû didin weke zewaca temen biçûk, pirsgirêkên jin û hevjîn, pêşxistina aboriya jin, diyardeyên şerê taybet yên ku li ser jinên ciwan bandor dikin. Bi taybet di nava rewşa koçberiyê de em bixwazin nexwazin pirsgirêk û zehmetiyên jiyanê derdikevin holê. Ev hemû hatin nîqaş kirin û bi armanca parvekirina van pirsgirêkan bi aliyên têkildar re xebat hat meşandin. her wiha di pilansaziya salê de hin nêrînên weke guhartina zihniyet û parvekirina jineolojî bi cinsê din yê di civakê de hat pêşxistin, perwerdeyên taybet yên ji bo mêran ketin meryetê û pêkhatin. Di heman demê de hin lêkolînên jinolojî yên taybet hatin pêşxistin.

**2- Ji bo parastina xwezayê ji hişmendiya kapîtalîzmê heta çi astê xebatên jineolojî hatin pêşxistin?**

- Di van demên dawiyê de û bi taybet di sedsala 21’emîn de, modernîteya Kapîtalîst serweriya xwe li tavahî bûyer û guhartinên ku di cîhanê de tên çêkirin kiriye. Bi giştî bi teknîk û pêşxistina tekneolojiya re bi hemû cîhan û gelan tehekum dike. Her tişt ji cewherê wê derxistiye û xistiye malê tekneolojiyê. Gihîştiye astekê ku xweza û ekolojiyê li gorî xwe saz bike û weke madeyekê were destgirtin. Her çiqas bikaribin mirov ji xwezayî qut bikin wê ewqas însan li xwezayê bi çavê madî lê binêre û fayde jê bigire. Li ser vî esasî vegerandina rihê xwezayê yê berê û xizmeta ekolojiyê û xwazayê em çawa dikarin bikin her wiha çawaniya qut kirina xwezayê ji bin hişmendiya hêzên kapîtalîstan de, etuliye yên kar hatin pêşxistin di nava wan koman de jin û mêr cihê xwe girtin. Nîqaş û pilansaziyên berfireh hatin rûdan her wiha di dawiyê de weke jineolojî çareserî û encam hat pêşkêş kirin. bê guman ev pişniyar û çareserî bi aliyên têkildar re hatin parvekirin.

**3- Di hundirê koçberiyê de jin rastî gelek zehmetiyan tê, her wiha gelek alî dixwazin îradeya jinê hedef bigirin. Li beramberî wê hûn çi kar û xebatê dikin?**

Bê guman ger em bixwazin koçberiyê bigirin dest, ji hişmendiya desthilatdaran hatiye xuliqandin. Hêzên serdest her tim xwestine gel talan bikin û ji ware wan bi darê zorê bidin derxistin da ku serweriya xwe li ser wê herêmê yan gelî bikin û gelê resen bide helandin. Bi taybet di nava Kurdistanê de, dijim bi hovîtiya xwe her tim bi armanca qirkirin û asîmîlasyonê mal û gundên Kurdan dane şewtandin, talankirin daye avakirin da ku gelê Kurd were tunekirin. Di encama van hovîtiyan de gel neçar dima koçber bibe. Gelê Efrînê ev bû 6 salin li herêma Şehbayê jiyan dike. Bê guman weke me berê anî bû ziman di rewşa koçberiyê de valatiyek tê çêkirin, her wiha zehmetiyên civakî jî derdikevin holê û pir alî dixwazin te qezenc bikin derdikeve holê. Ji ber vê yekê weke Navenda Lêkolînên Jineolojî lêkolîna “Bandora koçberiyê li ser jin, zarok û civakê” hat pêşxistin. Ev mijar bi sazî û destgehên herêmê re hat parve kirin. Çawa em bikaribin ji pirsgirêkên ku di encama koçberiyê de tên rûdan bibin çareserî.

**4- Li rex kar û xebatê we yên ji bo jinê, kar û bernameyên we yên ji bo perwerdekirina mêr di çi astê de ne?**

Weke ku di konferansa zanistî ya ku hatiye li dar xistin de hat diyar kirin ku wê xebatên taybet ji bo mêr yên ku temsîlciya nîvê din yê civakê dikin bên pêşxistin. Ji bo çareserkirina pirsgirêkên civak û malbatê, her wiha lêhurbûnek der barê jinê de di serê wan de bê çêkirin. Li ser van esasan perwerdeyên xweser mêr li heleb û Şehbayê hatin pêşxistin. Nêzî 27 mêran tevlî van perwerdeyan bûn. Bi rastî perwerdeyên serkeftî bûn nêrîn, nîqaş kirina pirsgirêkan her wiha çareserî hatin nîqaş kirin. Helbet ev xebat wê were berdewam kirin.

**5- Hin lêkolînên we hatin çêkirin, naverok û armanca we ji van lêkolînan çi bûn?**

- Belê, du lêkolînên me yên sereke hatin pêşxistin. Bê guman ev pilansaziyekî li ser asta giştî hat derxistin û tavahî herêman li ser van du mijaran lêkolînên xwe çêkirin. Yek Etîk û Estetîk û ya din mijara Koçberiyê bû. Di mijara etîk û estetîk de me jinên ciwan hedef girtin ji ber yê ku herî zêde di nava van mijaran de dimîne jinên ciwan yên civakê ne. lêkolîn der dora etîk û estetîk di serdema heyî de çawa hatiye destgirtin. Pirsgirêkên ku derdikevin di vê mijarê de em çawa dikarin sererast bikin, sîstemên desthilatdar bi çi çavî li vê mijarê dinêrin û çawa dixwazin civakê bi terzê xwe bixapînin û li gor xwe saz bikin. Nirxandin û çîroveyên berfireh hatin teysandin. Her wiha lêkolîna koçberiyê bi jinên civak û yên saziyan re hat çêkirin. Weke ku her kes dizane herêma Şehbayê herêmekî dorpêç kiriye û gelê Efrînê koçberî vê deverê bûne. Di nava rewşa koçberiyê de, zehmetî, kêmasî, pirsgirêkên civak û malbatê her wiha bandora şerê taybet di koçberiyê de. ev hemû li ser jin û malbatê bandor dikin û zehmetî tên kişandin. Li ser wan bingehan lêkolîn hat çêkirin û encam hatin derxistin.

6- Pilanname û bernameyên we yên dema pêş çi ne?

Bernameyên me yên perwerde û xweperwerdekirinê wê berdewam bin, dei van demên dawiyê de bi taybet li ser pirtûka “Sisyolojiya Azadiyê” em disekinin û perwerde dibin. Weke Navend her tim lêkolînan esas digire û pêşxistina van lêkolînan em armanc dikin. Di demên pêşiya me de ji bo pêşxistina aboriya jin di koçberiyê de, wê hin pilansazî bi desteya Aboriyê re were pêşxistin. Her wiha ji bo 25 ê Mijdarê Roja cîhanî ya şiddeta li dijî jinê wê pilansaziyên me yên cihreng hebin.

## Ji Pênûsa Jin

### Şûna koçberiyê em xwe biparêzin

**Nehîr Pale**

Eger mirov daxwaza jiyaneke bi rûmet bike dive mirov têbikoşe û civaka têdikoşê wê li hemberî êrîşên dagirkeran li ber xwe bide, êdî tu di navbera koçberî û mirinê de namîne û ji mirine natirsê. Di dîrokê de gelên bindest dema ku li hemberî dijminê xwe dest bi têkoşînê dikirin û daxwaza azadiya xwe dikirin silogana wan `Ya mirin ya serkeftin` bû niha jî gelên azadîxwaz û bi taybet jin silogana `An serkftin An serkeftin` bi kar tînin. Ev silogana gelên azadîxwaz bû û tu carî rê nedidan koçberiyê. Ango koçberî ji xwe re çareserî nedidîtin.
Hûn koçber bûn û li pey we bi hezaran mirov man, dibe ku bav û dayîka we jî di nava wan de bin, her ku buyerek li ser xaka we biqewimê gelo hûn dikarin fêr bibin ku ne xema we be û wijdanê we rehet be. Hûn dikarin ji bîr bikin ku hûn li wê xakê ji dayîk bûne û dema hûn dimrin hûnê li wê xakê werin veşartin. Hûn neçarî koçberiyê nehatine kirine, hinek kes dibêjin ji ber paşeroja zarokên xwe em çûne derveyî welat, hinek dibêjin kar nîne em derketine derve û hinek jî dibêjin av û elektirîk nîne em koçber dibin.
Bi taybet di bin navê zewacê de rêkirina keçan a Ewrûpa bûye modêl. Dayîk dikarin pesna xwe bidin û bêjin me keça xwe da xortekî li Ewrûpa, piştre jî bi aqilê her kesî dileyîzin ku ew jî wekî wan bikin.
Koçberî ne ji ber şert û mercên şer e, niha êdî bûye rêbazekî revê. Jin ji civaka cinsiyetparêz direvin Ewrûpa û ew li gel xwe difikirin ku ew ê li Ewrûpa rehet bijîn. Hemû jinên berê xwe dan Ewrûpa nizanin ku ketine bin rehmeta kaptalîzmê de. Jin ji aliyekî ve dikeve xefka kaptalîzmê û ji aliyê dîtir ve ji civaka xwe dûr dikeve, dighîjê rewşa ku gora xwe bi destê xwe bikole.
Kî em fêrî koçberiyê kirin? Hemû dewletên ku têkoşer û şoreşgeran qebûlnakin û wan li ser xwe xeter dibînin wan ji welatê wan dûr dixînin û ew di hesreta welatê xwe de dimrin. Dewleta Tirk a dagirker bi koçberiyê şerê herî mezin li hemberî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dide meşandin. Her kesî teşwîq dike ku ji welatê xwe koçber bibin, Kurdistanê bi rêbazên dîtir dagir dike. Ya herî zêde tê lîstoka dewleta Tirk a dagirker jin e. Dayîk dema ku dibêje ez li ser zarokên xwe ditirsim, koçberî jî ne çareserî ye, çima nayê bîra dayîkê ku zarokên xwe fêrî xwe parastinê bike û diçe wan fêrî tirs û revê dike? Eger tu di ruh de hatî kuştin tu wateya wê nîne tu fêzîkî bijî. Her jineke koçberî Ewrûpa bûye di ruh de hatiye kuştin, wê fêr dikin ku dûrî hemû nirxên manewî yên gelê xwe bijî û bi tena xwe bimîne. Êdî ew jin 24 saetan dixebitê ji bo debara jiyana xwe bike, dighîjê asta ku nema bi kesekî re bide û bistîne. Bi wext re ji heqîqeta xwe dûr dikeve û xweşiya jiyanê di vê yekê de dibîne. Lê ew ne di ferqê de ye ku dûr mayîna ji dîrok û xaka xwe tê çi wateyê.



# ‘Berxwedana gelan planên dijmin têk birin’

Endamê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) Mustefa Ebdo diyar kir ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bi êrêkirina hêzên navneteweyî yên pêk tê û got, berxwedan û têkoşaîna gelan planên dagirkeriya Tirk têk birin.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di rojên dawî de, dewleta Tirk êrîşên xwe li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijwartir kiriye, di wan êrişan de gund, dibistan, xelkên sivîl, jin, zarokan jî dike hedef. Bi salane dewleta Tirk bi armanca dagirkeriya heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrîşan pêk tîne. Dewleta Tirk dixwaze pirojeya Rêveberiya Xweser û destkeftiyên şoreşê tunê bike. Ev êrîş heman demê siyasetên dagirkeriyê yên yê qirkirinê ku li hemberî gelên heremê dide meşandin, eşkere dike. Bi salvegera dagirkerina Serêkaniyê û Girê Spî re dewleta Tirk a dagirker careke din êrîşên xwe yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kiriye. Di encama êrîşan de binesaziya herêmê jî dike hedef. Armanca sereke ji êrîşên dewleta tirk a dagirker tunekirina aboriya herêmê û koçberkirina gelên wê ye, li hemberî wê jî berxwedana gelan gihiştiye lûtkeyê.
Derbarê êrîşên dagirkeriya Tirk yên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê endamê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê Mustefa Ebdo ji rojnama me re axivî.

**‘Dewleta tirk a dagirker qirkerê gelan e’**

Mustefa Ebdo diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker li ser xwînan gelan hatiye avakirin û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker bê navber şer û êrîşan li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dimeşîne, ji 4`ê Cotmehê ve, dagikerî bi rengekî dijwar û hovane êrîşî herêm û binesaziya herêmê dike. Dewleta Tirk a dagirker hebûna gelên resen qebûl nake. Dema ku dewleta Tirk a dagirker dibînê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kurd destkeftiyên mezin bidest xistin, gelên herêmê bi pirojeya Rêveberiya Xweser jiyanek komînal bi hev re jiyan dikin, ji ber vê sedemê li dijî gelên herêmê û bi taybet gelê kurd êrîşan pêk tîne. Dewleta tirk a dagirker mafê gelan ji gelan dibe û cîhan li hemberî



wê çavên xwe digirin. Em nikar van bûyerê ku niha çêdibin; êrîşa Humis, şerê li Filistîn û Idlibê wan ji hev dûr bixînin, ji ber tê diyarkirirn ku hevpeymaneke di navbera dewletan de. Hêzên navneteweyî çavê xwe ji êrîşên dewleta Tirk a digirker li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê digire. Herwiha Rûsya û tevahiya hêzên navneteweyî ji bo berjewndiyên xwe çavê xwe ji kiryarên dewleta Tirk a dagirker digrin.”

**‘Armanca dewleta tirk a dagirker têkbirina aramiya herêmê ye’**

Mustefa Ebdo balkişand ser bêdengiya hêzên navnetewî li hemberî êrîşê ku dijî glan tên meşandin: “Bêdengiya Emerîka tê wateya ku wê gilopa kesk daye dewleta Tirk a dagirker ku êrîşên xwe li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk bîne, li hemberî wê jî berjewendiyên wê hene, herwiha dixwaze rê li pêşiya Rûsya bigire û guhertineke demokarafîk li ser xaka Kurdistanê bike. Dewleta tirk a dagirker naxwaze gelê kurd û pêkhateyê herêmê bi aramî jiyan bikin, metirsiya wê heye ku bandorê di nava gelê wê de jî bike, Ji ber di nav tirkiyê yê de rewşa aborî gelek xerabe û welatiyên wê nerazîbûna wê ji vê rewşê heye, ji bo wê dixwaze bi pêşî de bireve û pirsgirêkê xwe derxe derve. Dewleta Tirk a dagirker bi navê olê gelê Tirk bi xwe ve girê dide û bi navê ol êrîşî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike, lê ew bi xwe dûrî olitiyê ye. Armanca dewleta tirk a dagirker ji binesaziya herêmê ku aboriya vir tune bike û milet dijî rêveberiyê derxînin. Di şerê Dêra Zorê ê dawiyê de her kes dizane destê dewleta tirk û Îranê tê de hebû û pilanênê wê li wir têk çû, ji bo wê rê li pêşiya wê neman êdî êrîşke hovane dijî pêkhateyê herêmê dike. ”

**‘Berxwedanê li hemberî êrîşan zêde bikin’**

Endamê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) Mustefa Ebdo axaftina xwe wiha qedand: “Gelê kurd nêzî 13`e hezar şehîd daniye û çeteyên DAIŞ`ê ku metirsiyek li ser tevahî cîhanê bû şikand, gereke dewletên navnetewî bi balkişandin êrîşên dewleta dagirker li ser herêmê bakur û rojhilatê Sûriyê qebûl nekin. Em bang li rewşenbîr û aştîxwazê cîhanê dikin ku li hemberî van êrîşan bisekinin û bêdeng nemînin, herwiha bi berxwedan, pênûs û dengê xwe em li pişta miletê xwe ne û em girêdayî bajarê xwe bin, berxwedana xwe zêde bikin ku rê nedin dijmin ku armanca wî here serî.”

# Ji nû ve afirandin û vejînkirin

**Sîpan Şînda**

Bê guman Şoreşa Rojava di jiyana gelê Kurd de ji hemû alî ve qonaxeke nû û gelekî mezin e. Ji beriya şoreşê, li Rojava hişmendiyeke Kurdewarî hebû, lê belê çand û hunera Kurdî, nirx û nêrandineke Kurdewarî di bin zor û zexta pergala Baasê de bû û bi awayekî sîstematîk dihate windakirin. Bêşik, armanca vê zor û zextê û pêstûriya sîstematîk, tunekirin û ji holê rakirina nasname, çand, huner, netew û kesayetiya Kurd û Kurdewariyê bû.
Piştî Şoreşa Rojava dest pê kir û DAIŞ’ê êrîşî Kurdan kir, Kurd ketin Qonaxeke nû de. Raste gelek gund û bajar hatin xirakirin û gelek canên ciwan li ser xaka Rojava ketin, lê belê azadî ne hêsaniye û berdêlê wê jî giran e. Li Rojava, ji aliyekê ve şerekî gelek dijwar hebû, ji aliyê din ve jî di warê çandî û hunerî de tekoşînek û zindîkirina kevneşopiyê dest pê kiribû. Di warê çandî û hunerî de birêxistinkirin pêş diket û ji bona sazîbûyînê gav dihatin avêtin. Vê yekê jî germiyek têxist nava civaka Rojava de û kesên di warê hunerî, çandî û civakî de xemxur êdî ketibûn di nava liv û tevgerê di, ji bona wê kevneşopiya Kurdewarî ya gelekî xurt şûnde vegerînin zend û bendên xwe badabûn. Çawa şervanan di çeperan de li hemberî neyaran şer dikirin, wan jî di çeperên parastin û vejînkirina çand û hunera Kurdî ya kevin de cihê xwe girtin û dest bi xebatê kirin. Yek ji van çeperên yekem ku hatî vekirin, Hunergeha Welat e. Bê guman vê saziya lêkolînê ya hunerî û çandî heta niha li Rojava gelek karên hêja kirine. Çepereka din ya xurt ku di vî warî de hatî avakirin jê Pargîn e. Pargînê jî weke Hunergeha Welat heta niha gelek kar û xebatên hêja kirine. Ez dixwazim li ser berhemeka wan bisekinim.




Bê guman klîba Nazê Nêrgiz a Hewşê (2021) ya ku Şervan Badînî gotî, meqamê wê ji aliyê Mehmûd Berazî ve hatiya çêkirin, derhêneriya klîbê Şêro Hindê kirî û ji aliyê Hunergeha Welat ve hatî çêkirin û belavkirin gelekî serkeftî bû. Dîsa bi derhêneriya Şêro Hindê û bi dengê dengbêj Qasimê Şero, di sala 2023’an de Pargînê klîbeke din ya bi navê Cer weşand. Strana Cer, straneke gelêrî ye û li aliyê Botanê tê gotin. Ev stran jî weke gelek stranên gelerî ber bi windabûnê ve diçû, lê belê bi saya serê Pargînê ew ji mirinê xilas bû û hat tomarkirin û klîba wê jî hat çêkirin. Di zarokiya min de, rehmetiyê bavê min her tim ev stran di palehiyê de, di dawetan de digot. Ev stran gelek caran dihate bîra min, lê belê piştî şehadeta bavê xwe min ew ji tu kesî nebihîstibû heta ku Pargînê ew di YouTubê de weşand. Mixabin hinek kes ne tenê dimirin, bi mirina wan re mîrateyek jî winda dibe. Piştî ku min strana Cer û klîba wê dît ez gelekî kêfxweş bûm. Klîbeke balkêş û watedar e. Klîp him kevnoşopiyê û straneka li ber mirinê dîtbar dike, him jî bi rêya vê stranê peyamên girîng dide dagirker û mêtîngeran. Weke tê zanîn, Kurdistan demekî dirêj di bin desthilatdariya Osmaniyan de maye. Her çenda ne bi awayekî yekgirtî be jî, lê belê ew



di bin serweriya çend Mîrektiyan de nîv serbixwe dihate birêvebirin. Di vê klîbê de ev dagirkirin û mêtîngeriya ji demê Osmaniyan ve heyî, û hetanî niha dewam dike, tê nîşandan. Klîb bi hebûna leşkerên Osmanî ya li ser axa Kurdistanê dest pê dike. Nîşandana çand, dawet û dîlanên Kurdî, şêwayî jiyana Kurdan ya civakî di klîbê de baş hatiye dîtbarkirin. Leşkerên Osmanî yên dagirker di klîbê de talanê dikine û radihêline nirxên Kurdan yên civakî û netewî. Ew xurûr û hisyeta Kurdan dişkînin û radihêlin namûs, mal û milkê wan. Hevkariya Kurdan ya bi mêtîngeran re jî bi awayekî eşkere hatiye nîşandan. Herwiha nifşên nû yên tolhildêr jî di klîbê de bi awayekî xurt tê nîşandan. Keçên Kurd yên bi cil û bergên leşkerî û çek û rext hatîn pêçan weke tolhildêr têne nîşandan. Ew di heman demê de wek nifşekî bi çanda netewî ve girêdayî têne nîşandan. Piştî ku leşkerên Osmanî çav berdidin namûsa Kurdan û êrîşî nirxên wan dikin, û xurûra wan dişkînin (ev yek bi şikandina Cerê tê nîşandan) gel radibe serhildanê. Çawa gel radibe serhildanê û bi dar û beran berdide pey wan û ew rev reva xwidê direvin û xwe li tiştên xwe jî nakine xweyî. Ji aliyê din ve jî şervanên Kurd û dawetkerên bi cil û bergên netewî destê xwe didine hevdû û li hemberî dagirkeran bi hevre dîlanê digirin. Herwiha, gel, kesên ku hevkariya mêtîngeran jî kirine digire û wan ciza dike.
Argûmentên ku di vê klîbê de hatine bikaranîn û peyamên têne dayîn, ji aliyê vejînkirina kevneşopiyê, vegera rayên netewî, xwedî lêderketina nirx û giyanê netewî û tolhildana nifşên nû ya. Ji dagirker û mêtîngeran ku bi sedê salane li ser Kurdistanê talanê dikin, bi awayekî serkeftî hatiye hûnandin.

# ‘Dagirkeriya Tirk têkbirina vîna nifşên siberojê dike armanc’

Semîra Hac Elî diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker li ber çavên cîhanê sivîl û zarokan dike armanc û tevahiya zagonên mafên mirovan bin pê dike û got, li hemberî sûcên dewleta tirk tevahiya rêxistinên mafê mirovan yên navneteweyî bêdengin û bi erkê xwe yê exalqî ranabin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên hovane yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne, dagirkerî di êrîşên xwe de sivîl û binesaziya herêmê dike armanc, herwiha dibistanên perwerdeya zarokan jî dibin armanca û bi hezaran zarok ji mafê xwe yên bingehîn yên dîtina perwerdeyê tên mehrûmkirin. Li gorî amaran di encama êrîşên dagirkeriyê Tirk yên domdar de, li herêma Cizîrê 31 dibistan, li herêma Firatê 9 dibistan, li herêma Şeheba 6 dibistan û li Minbicê jî 6 dibistan hatine topebarankirin û armancgirtin. Herwiha di encama êrîşên dewleta Tirk a dagirker de 8458 zarok ji mafê xwendinê û perwerdê hatin qutkirin. Dewleta Tirk a dagirker bi hedefgirtina dibistanan tevahiya zagonên parastina mafê zarokan bin pê dike, lê tevî vê yekê jî tevahiya rêxistin û saziyên navneteweyî yên parastina mafê zarokan bêdengin û tu helwestê nîşan nadin, ev dirûtiya sazî û rêxistinên mirovî yên navneteweyî eşkere dike.

Derbarê êrîşîn dewleta Tirk a dagirker yên li dijî herêmên bakur û rpjhilatê Sûriyê û hedfgirtina dibistanan, herwiha bêdengiya navneteweyî ya li hemberî êrîşan, hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya bakûr û rojhilatê Sûriyê Semîra Hec Elî ji rojnemeya me re axivî.

Semîra Hac Elî diyar kir ku armanca hedefgirtina dewleta Tirk a dagirker ji herêmê re têkbirina fikrê azad e û wiha got: “Armanca êrişên dewleta Tirk yên li ser herêmê tunekirina Rêveberiya Xweser û projeya neteweya demokratîk e, bi vê armancê dagirkeriya Tirk binesaziya herêmên bakur û rojhilatê Suriyê û destkeftiyên gelên herêmê dike armanc. Her wiha di nava van êrişên hovane dewleta Tirk a dagirker de bi awayekî rasterast dibistanên perwerdeyê tên armancgirtin, ew bi vê yekê dixwaze îradeya nifşên siberojê têk bibe.”

**‘Hedefgirtina binesaziyên herêmê’**

Semîra wiha berdewamî da axaftina xwe û got: “Dijminatiya dewleta Tirk a li dijî gelên resen yên herêmê û bi taybetî ya li dijî gelê kurd dîrokî ye, dagirkeriyê bi 100’ê salan hewil dide kurdan qir bike. Êrîşên niha ku li ser herêmê têne meşandin berdewamiya wê siyaseta qirkirinê ya berî 100’ê salan e. Piştî avabûna Rêveberiya Xweser û kombûna tevahiya gelên herêmê di bin sîwana wê de, herwiha pêşketina demokrasiyê û wekheviyê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, dewleta Tirk a dagirker ev projeya demokratîk li ser desthilatdariya xwe ya faşîst xeter dît û bi van êrîşên xwe yên domdar hewil dide vê projeyê têk bibe. Dewleta Tirk bi hedefgirtina binesazioya herêmê, dixwaze tevahiya gel koçber bike û herêmê vala bike, da ku projeya xwe ya dagirkirina herêmê pêk bîne.”



**‘Berxwedanî û têkoşîna gel mezintir dibe’**

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya bakur û rojhilatê Sûriyê Semîra Hac Elî da zanîn ku hêzên navneteweyî li hemberî êrîşên dijmirovî yê dagirkeriya Tirl tu helwestê nîşan nadin û axaftina xwe wiha qedand: “Em wekî Desteya Perwerdê û Fêrkirinê a bakur û rojhilatê Sûriyê, em ê her parestvanên zarokên xwe bin, tekoşîn û berxwedanî her wê berdewam be, her wiha ji bo jiyanekî bi ewle û perwerdahiya zarokan, em ê têkoşîneke mezin bikin û hewil bidin siberoja zarokan ronî bikin. Em dizainin ku armanca dewleta Tirk a dagirker qirkirina gelê kurd e, lê hemberî wê em jî têkoşîna xwe mezintir bikin. Li hemberî hedfgirtina zarokan cîhan bêdenge, herî dawiyê 2 zarokan di encama êrîşên dagirkeriyê de jiyana xwe ji dest dan. Bêdengiya rêxistin û saziyên navneteweyî ya li hemberî sûcên dagirkeriyê binpêkirineke ji pîvanên exlaqî re ye, tev ji bo berjewndiyên xwe çavên xwe ji kiryarên dagirkeriya Tirk digrin.”

# Insanan jî sansur dikin!

**NAVENDA NÛÇEYAN**

**Navê hepsan ti carî bêyî qedexe û sansuran nayê hilanîn. Li her dera cîhanê tevî ku hin mafên hepsiyan bi qanûnan hatine misogerkirin jî ev mafên wan tên binpêkirin. Pêşangeha “Return to Sender” bala xelkê dibe ser rakirin û qedexekirina mekanên hevpar ên hepsiyan û vê yekê jî weke sansurekê dinirxîne.**

Li gelek welatan qanûnên hatine çêkirin, qaşo azadî û mafên insanan diparêzin lê esas, ev qanûn pêk nayên. Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) jî yek ji wan welatan e ku qanûnên xwe yên heyî gelek caran binpê dike. Nexasim jî rewşa heps û hepsiyên li DYE´yê gelekî xirab e. Em vê yekê ji pêşangeha “Return to Sender” fêmdikin. Ev pêşangeh bala xwe dide ser sansurkirinên li hepsan û dide nîşan ku mafê hepsiyan tên binpêkirin. Mesele ne tenê qedexekirina hin materyalan e, ev pêşangeh her wiha rakirina mekanên hevpar ên hepsiyan jî weke sansurekê dinirxîne.

Kuratoriya pêşangehê Mariame Kaba dike ku ew yek ji aktivîstên li hemberî koledariya li hepsan e. Ew vê pêşangehê bi hevkariya PEN’a Emerîkî bi rê ve dibe. Di pêşangehê de xebatên hunermend, aktivîst û nivîskarên ku di vê dawiyê de di hepsê de mane, tên nîşandan. Yanî pêşangeheke komî ye. Berhem û xebatên di vê pêşangeha komî de, her wiha sansura li hepsê jî rexne dikin. Beşdar, bi vê pêşangehê hewl didin bala xelkê bêhtir bibin ser cihên hevpar ên ku hepsî li wir li hev kom dibin, dixebitin û bi hev re wext derbas dikin. Pêşangeh rakirina cihên hevpar ên ku têkiliyên hepsiyan xurttir dikin jî weke sansurekî dinirxîne.

**Qedexe û sansur berhema polîsan e**

Mariame Kaba bi pirsgirêkên hepsiyan û sansurên li hepsan dadikeve. Û ew her tim li çareseriyan digere. Mariame Kaba ji bo hepsan dibêje, “Rêveberiyên hepsan tenê materyalan sunsur nakin, wekî din ew insanan jî sansur dikin û nahêlin werin gel hev.” Li hepsê pirtûk, name û hin berhemên hunerî her tim hatine sansurkirin û bi vî awayî hepsî hatine cezakirin. Kaba ji bo vê rewşê û nêzîkatiya hepsan jî dibêje, “Qedexeyên li ser wêje, huner û ragihandinê, dikin ku hepsî bêhtir krîmînalîze bibin û ev nêzîkatî yek ji berhemên polîsan e ku bi vî awayî cezayê insanan zêdetir dikin û dikin ku ew di hepsan de tengavtir bibin.”

**Nivîskar behsa serpêhatiyên xwe dikin**

Di pêşangehê de odeyeke taybet heye, ev ode weke postexaneyekê hatiye sêwirandin. Ew dişibe pirtûkxaneyekê jî. Lê mirov dikare bibêje, ew ji herduyan bêhtir dişibe hucreyekê jî. Di vê odeyê de naxasim metnên radîkal ên ku nivîskarên reşik nivîsandine, cih digirin. Her wiha gelek berhemên dîtbarî, nivîskî û yên ku mirov li wan guhdarî bike, hatine bicihkirin di vê hucreyê de. Bi riya înstalasyonan qedexe û sansura li hepsan nîşan didin. Hunermend û nivîskarên ku ketine hepsê serpêhatiyên xwe yên sansurê bi riya dengan parve dikin bi xelkê re. Mariam Kaba dibêje, “Dengê insanan jî tê sansurkirin, bedana wan, ziyaretên wan û xwendin û lêhûrbûna wan tê sansurkirin. Bi her awayî mekanîzmayên zordestiyê yên ku dixwazin hin tiştan bidin jibîrkirin, bi kar tînin.”



**Rêbaza ‘giran û dirêj’ a hepsan**

Yek ji rêveberên PEN’a Emerîkî, Moira Marquis da zanîn ku hepsî nikarin materyalan zû bi zû bi dest bixin û heta ku ew xwe digihînin materyalan, gelek wext dibuhire. Marquis ji bo polîtîkayên hepsê yên li ser pirtûk û berhemên nivîskî jî dibêje, “Polîtîka û rêbazeke wan a ‘giran û dirêj’ heye. Ev polîtîka ku dikin nivîskar û hunermendên li hepsan xwe bi derengî bigihînin berheman. Gelek nivîskarên ku endamê PEN’a Emerîkî ne, nikarin nusxeyên pirtûkên ku nivîsandine, wergirin.” Marquis da zanîn ku rêveberiyên hepsan ji pirtûkan ditirsin û ji ber ku di navbera hepsiyan de têkileyekê çêdikin, pirtûkan wekî tiştekî tehlûke dibînin.

**Ew dê nikaribin bi temamî kontrol bikin!**

Li gel astengî, sansur û zehmetiyan hemûyan, dîsa jî hin berhemên hepsiyan derdikevin derve û ev pêşangeh jî nîşaneya vê yekê ye. Mariame Kaba vê pêşangehê li hemberî qedexe û sansurên li hepsan weke çalakiyeke berxwedêr dibîne û dibêje, “Ew her çend bixwazin jî nikarin bi temamî têkiliya me ya bi hepsiyan re ji holê rakin. Ew her çend rêbazên cur bi cur bi kar bînin jî dê nikaribin insanên li hepsê li gorî dilê xwe kontrol bikin.”



# Pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re’ berdewam e

Pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re’ ku di 10’ê Cotmehê de hatibû destpêkirin, li tevahiya cîhanê deng veda û çalakiyên wê berdewam in. Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî tevlî pêngavê bûn.

**Navenda Nûçeyan/ Qamişlo**

Bi daxwaza azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û çareseriya pirsgirêka Kurd di 10’ê Cotmehê de Pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re’ destpê kir. Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re’ dan destpêkirin.

Di serî de li bajarê Strasbourgê yê Fransayê ku Konseya Ewropa, Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê (CPT) û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) lê ne, ji bo temsîla temenê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li 74 bajaran daxuyaniyên çapemeniyê hatin dayin. Tevî welatên Ewropayê li Bangladeş, Pakistan, Tokyo, Hindistan, Kenya, Efrîka Başûr, Latîn Emerîka û bi dehan navendên din di heman demê de daxuyanî hatin dayin.

Di heman çarçoveyê de li London û Liverpool ên Îngilîstanê, Dublin a Îrlandayê û li paytexta Wales Cardîffê civînên çapemeniyê hatin lidarxistin.

Bi heman armancê li Îngilistanê jî semînerek hate lidarxistin. Amadekara semînerê Roza Salih bû û endamê Unisaneyê Steven Smalley, parlementerê Partiya Neteweyî ya Îskoçyyaê Chris Steerfens, endama jineolojiyê Jany Krison wek axêver beşdarî semînerê bûn.

Li Glasgowê jî civîneke çapemeniyê hate lidarxistin û hate destnîşankirin ku aştî bi azadiya Rêber Abdullah Ocalan ve girêdayî ye.

Li bajarê Sîdney ê Awûstralyayê, parlamenter û senator jî di nav de gelek kesan piştgirî dan pêngavê ku di asta navneteweyî de ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û çareseriya pirsgirêka Kurd hate destpêkirin. Gelek parlamenter û nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl tevlî civîna çapemeniyê bûn. Di civînê de metna kampanyayê hate xwendin ku tê de hate xwestin, tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tavilê bi dawî bibe û pirsgirêka Kurd bê çareserkirin, azadiya Abdullah Ocalan misoger bibe.

Herwiha li bajarê Selanîk ê Yewnanistanê akademîsyen û rêxistinên civakî yên sivîl daxuyaniyek dan çapemeniyê. Ji Zanîngeha Arîstoteles û Makedonyayê Andreas Takis, ji Zanîngeha Arîstoteles a Selanîkê Zanyarê Siyasetê Dimitris Spyropoulos, endamê Înîsiyatîfa Parêzeran a Alternatîf parêzer Thodoris Papadopoulos, endamê Klînîka Piştevaniya Civakî ya Selanîkê Yannis Raptis, ji Doktorên Nexweşxaneya Selanîkê doktorê tipê Stathis Giannakopoulos, endamê SE VI-OME Makis Anagnostou, Serokê Komeleya Muzîsyenan a Bakurê Yewnanistanê Dimitris Zervoudakis, ji Komeleya Xebatkarên Pirtûk Kaxizan û ji Zanîngeha Arîstoteles Panagiotis Xoplidis tevlî daxuyaniyê bûn.

Di heman çarçoveyê de Tevgera Jinên Kurd a li Ewropayê (TJK-E) jî panelek lidar xist. Panel li Navenda Çanda Elewiyan a Strasbourgê pêk hat û qala paradîgmaya azadîparêziya jinê ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hate kirin. KCDK-E û CDK-F ku rêxistinên sîwanî yên komeleyên Kurd ên li Ewropa û Fransayê ne, daxuyaniyên çapemeniyê yên dostên gelê Kurd silav kir û got, “Ev yek hîn destpêk e.”

Roj bi Roj pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re’ berfirehtir dibe. Rewşenbîr, hunermend, siyasetmedar û akademîsyenên Ereb jî bi daxuyaniyekê tevlîbûna xwe ya ji bo kampanyaya “Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” bi daxuyaniyê diyar kir.



Başûrê Kurdistanê jî xwedî li Pêngava Azadiyê derket. Li Silêmaniyê siyasetmedar, akademîsyen, rewşenbîr û çalakgerên civaka sivîl bi daxuyaniya çapemeniyê xwedî li Pêngava Ji Abdullah Ocalan re Azadî-Ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî derketin.

Ji bo silavkirina pêngava ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka Kurd, li paytexta Awûstûrya Viyanayê meşek hate lidarxistin. Meşê ji Karlsplatzê destpê kir û heta Stephansplatzê dewam kir.

Li bajarê Chennaî yê hindistan jî, têkildarî pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, çareseriya siyasî ji pirsgirêka Kurd re’ daxuyaniyek ji çapemeniyê re hate dayin. Civîna çapemeniyê li Channaî Press Clûb a li paytexta eyaleta Tamîl Nadû Chennaiyê hate lidarxistin û gelek rêxistinên Tamîlê piştgirî dan.

Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên Ewropa (KCDK-E) jî bi daxuyaniyekê diyar kir ku ew beşdarî pêngava ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî, bûne

Înîsiyatîfa Gel a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî tevlî pêngava “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî’ bû. Endamên Rêveberiya Xweser, rêveber û endamên rêxistinên sivîlcivakî, parsityên siyasî, rûsipiyên eşîretên Kurd û Ereb, rêxistinên jin û ciwanan, TEV-DEM û bi sedan kes tevlî daxuyaniyê bûn.

Derbarê heman mijarê, Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi daxuyaniyekê ragihandin ku ew tevlî pêngava ‘Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî’ dibin. Bi dehan ji endamên tevger û rêxistinên jinan, Rêxistina Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi rêya daxuyaniyeke çapemeniyê beşdarbûna xwe ji kampanyayê re ragihand.

# Ji Hêzên Parastina Neteweyên Karennî peyama piştgiriyê bi gelê Rojava re

**Hêzên Parastina Neteweyên Karennî yên Myanmarê bi peyamekê piştevaniya xwe ji bo gelê Rojavayê Kurdistanê nîşan da.**

Hêzên Parastina Neteweyên Karennî yên Myanmarê piştî dîtina şoreşa û têkoşîna wekheviya ku niha li Rojavayê Kurdistanê tê kirin, peyamek hevgirtin û piştevaniyê belav kir.

**Peyama Hêzên Parastina Neteweyên Karennî yên Myanmarê wiha ye:**

**Hevalên hêja yên Rojava;**



Em bi xemgînî ji êrişên asmanî yên vê dawiyê yên ku armancên ne-leşkerî, di nav de sivîl û binesaziya sivîl li Rojava dikin armanc, agahdar bûn. Em dikarin bi zehmetî, fedakarî û lehengiya xwişk û birayên xwe yên li Rojava re têkildar bin, ji ber ku em zêdetirî 70’î sal in li ber zilma dîktatoriya leşkerî li ber xwe didin.

Li welatê me cûntaya leşkerî, kiryarên terorîstî yên bi vî rengî dike. Ji bilî ku leşkerên Cûntayê sûcên şer li dijî gelê me yê sivîl dikin, dibistan, nexweşxane, avahiyên olî, kampên penaberan, gund û bajaran gelek caran dibin hedefa êrişên hewayî yên Cûntayê û topên giran.

Ji tevgereke şoreşgerî derbasî tevgereke din a ku civaka navneteweyî çavê xwe jê re girtiye, em dixwazin bibêjin, ‘Em têkoşîna we dibînin, têkoşîna we ya azadî û edaletê dibînin’. Nebûna kesên ku li dijî xerabiyê radiwestin, ji xirabiyê bi xwe tirsnaktir e.

Ji bo hilweşandina her zalimekî divê em bi hev re meşa xwe bidomînin. Em bi hemû hêzên şoreşger ên li çaraliyê cîhanê re ku cihêrengiya nijadî, olî û azadiya jinê hembêz dikin re radiwestin. Werin em bi hev re piştrast bikin ku desthilata îdarî ya li ser welatekî di destê gelê wî de ye. Bila armancên me yên siyasî bigihêjin bingeheke xurt ji bo avakirina yekîtiyeke federal a demokratîk a pêşerojê ya bi wekhevî, edalet û xweseriya neteweyî.”

Di 1’ê Sibata 2021’ê de, artêşa Myanmarê bi derbeyekê di şevekê de desthilatdarî bi dest xistibû, çend demjimêran piştre ji bo parlemana nû hilbijêre cara yekem civiya. Artêş hilbijartinên Mijdara 2020’an de sextekariya dengdêran îdia kir, dema ku partiya nûnerê wê ji hêla Lîga Neteweyî ya ji bo Demokrasiyê, bi serokatiya Aung San Suu Kyi, ku serkeftinek ji nû ve hilbijartinê bi dest xist, hate têkbirin. Çend roj piştî derbeyê, li Yangonê û li seranserê welêt xwepêşandanên girseyî derketin. Tevî ku hin bûyerên tundûtûjiyê yên yekalî hebûn, hêzên ewlehiyê bi piranî destûr dan ku xwepêşandanên aştiyane li seranserê meha Sibatê werin lidarxistin. Lê di dawiya mehê de, cûntayê taktîkên tundtir bi karanî, ji ava şidayî, lêdan û guleyên lastîkî bigire heta guleyên rastî hatin bikaranîn.

# Êrişên dagirkeriyê û tekoşîna gelê berxwedêr

**îmam Hecî Hesen**

Dewleta Tirk ya mîtinger û kujer, her ku dikeve nav qeyran û aloziyan erişên xwe yên hovane zêdetir û girantir dike. Dixwaze ku astengî û nakokiyên xwe di bin rojevên eriş û şer de veşêre û rojevan biguhere û armancên xwe yên qirêj pêkbîne.
Tê zanîn ku tekoşîna şoreşa Kurdistanê li hember mîtingerî û dagirkeriyê di bin hemû zor û zahmetiyên herî mezin da didome.
Ji bo ku Çareseriya pirsgirêka Kurd û Kurdistan pêk neyê û tekoşîna şoreşî were tesfiye kirin Dewleta Tirk û piştgirên wê her rêbazî kar tînin.Ne qanûnên Navnetewî ne jî Makezagon û qanûnên xwe yên hundirîn pêk tînin. Dewleta Tirk komarbûna xwe daye aliyekî û wek komara mafya tevdigere.
Li Bakurê Kurdistanê nahêlin ku bi rêbazên yasaî û demokratîk kesek dengê xwe derxe, Naxwazin û nahêlin ku kesek li hember dagirkerî,asimilasyonê û li hember neheqiyê, bê edelatî û kedxwariyê refleks bide û hest û fikrên xwe bîne ziman.
Kesên ku dengê xwe derdixe û fikrên xwe tînin ziman digrin û tavêjin zindanan û dîl digrin.Li ser derew û şahidên sixte cezayên giran didin.Girtiyên ku demê cezayên xwe xelaskirî bi bahaneyên keyfî nayên berdan û dema girtina wan dirêj dikin. Ji bo ku girtî serê xwe natewînin işkencê û binpêkirinên mafên mirovahî gihiştine asta herî jor.
Li dijî Siyasetmedar, Rewşenbîr, Rojnamevan, Şaredar û hemû kesên welatparêz nêçîrvaniyeke bê exlaq tê kirin.
Ji milekî din ve li ser navê Huda-Pare fereseta netewî û welatparêzî dixwazin ku were şêlû kirin.Dîsa girêdayî van lîstikên qirêj, kujerên hezaran welatparêzî endamên Hizbil-Kontra hatin berdan û henek ji wan kujeran di bin şemsiya AKP de li parlemena Tirka hatin bi cih kirin.
Li ser zimanê Kurdî zextek giran pêk tên. Navên ku li ser saziyan, nivîsên li ser arma/tabela tên rakirin.
Tecrîda li ser Rêberê gelê Kurd û hevalên wî yên di zindana Imralî de kûr û girantir buye. Di asta gerdûnî de wek sûçekî dijî mirovahiyê tê nasîn û şîrove kirin.
Tecrîd bi rêbazekî sinsî li ser hemû girtiyên Tevgera Aazadiyê di meryetêdeye.
Girtiyên tevgerê, ji bo ku tecrîd di asta pratîkê de pêk were dişînin bajarên herî dûr û malbat bo derftên bi zahmet nikarin biçin dîlgirtiyên xwe bibînin.
Bi rastî tecrîd tenê ne di zindanê de pêk tê.Tecrîdek giran li ser hemû deverên kurdistanê di meryetêdeye.
Gelén Bakur wek zindanek nîv vekirî di astekî xerab de di nav jiyan û tekoşînek siyasî,aborî deye.
Xwezaya Kurdistanê çi li Bakur çi li Başur û Rojava di bin êrişek hovanede têye talan kirin.Daristan tenê şewitandin û qut kirin,herêmên dîrokî tên hilweşandin.
Demografîk tenê li Rojava nayê guhertin; li Bakur û Başurê Kurdistanê jî bi rêbazên goçberiyê, bi valakirina welat têne guhertin.
Di erdheja meha Sibatê de siyasetek gellek qirêj û derveyî mirovahiyê pek hat; di destpékê de hewara gel nehat bihîstin û alîklarî di asta dewletê de pêk nehat. Piştî wê jî, nehiştin ku gel û saziyên sivîl alîkar bibin. Neh meh di ser erdhejên derbas dibin lê hin xirabiyên erdhejê li gelek deveran aşê demê dide jıyankirin..Bi vê rêbazê bûn sebeba koçberiya milyonan kesan.Dixwazin ku kesên li ser nanê qewmiyetê li welaten di bin li welat bi cih bikin.
li Bakur bi deh hezaran kesên ne Kurdistanî têne bi cih kirin. Mînak li Wan'ê ji bo 15000 kesên Tirk ên Ahiska bi vî awayî têne bi cih kirin. Demak berê de ji Afganî li Bakurê Kurdistanê hatibûn bi cih kirin û ew siyaseta qirêj tê domandin.
Ji milekî din ve,dewleta Tirk, bi alîkarî û dest dayina xiyaneta Berzaniyan û PDK'ê Kurdistana Başur wek mîtingehek nû zêdetir bi xwe ve giredaye û aboriya herêmê % 70'ê bi dest xwe xistiye û bi her alîve kevneşopî û çanda Kurda kiriye bin xeteriyek mezin.
Zêdetirî 50 baregihên leşkerî ava kiriye û hêdî hêdî statuya Başur bervî mîtingeriyek kilasîk ve dimeşîne. Ji bo ku hemî Başur istîla/dagir bike ew du salin ku bê navber bi her rê û rêbazên bê qanûnî û bê exlaqî dîse bi hevkariya xiyaneta Berzaniyan û PDK'ê dixwaze ku bi aliyê leşkerî ve jî dagirkeriya xwe temam bike.
Lê belê, ji bo ku PKK'ê li pêşiya wan veke dîwarekî pola disekine û temsîlîyeta şaristaniya demokratîk dike,hemû hêzên modernîst; henek rast û rast henek jî bi rêbazekî durûtî bi hevkariyek qirêj dixwazin ku xeta mirovatiyê tasfiye bikin.
Li hember ew siyaseta qirêj û dewleta dagirker û mîtinger gerîleyên Azadiyê tekoşînek pîroz û bi rûmet dimeşînin û rê nadin ku dagirkerî ancam bigre.

Dîsa; wek tê zanîn Şoreşa Rojava di bin gef û êrişên giran û di nav jiyanek dorpêçkirîde rojane dibe hedefên erişên dewleta Tirk a faşîst û qirker. Dewleta Tirk destpêke bi destê El Nusra,DAIŞ û El Qaide xwest ku Şoreşa Rojava tek bib û deryê jiyana azad ku li gelên Kurd û yên harêmê vebuyî asteng bike û bigre.
Lê bi berxwedana tekoşer û gelên me û destgirtiya dostên tevgera azadiya Kobanê azad bû û serberjêriya wan teroristan dest pêkir û hatin şikestin. Bi rastî şikestina wan şikestina dewleta Tirk û hevalbendên wan bû.Şikestina wan bo dewleta qirker xeteriyek mezin bû.Ji ber ku tola vê ancamê bigre pêvajo bi yek alî xera kir û dîsa dest bi şerê xwe yên qirêj kir.Di sala 2015 û vir ve ew şerê xwe yên gemar didomîne.
Li çiyayên Azad li dijî gerîllayên mirovahiyê çekên qdexekirî, yen termobarik,yan kîmyewî û Taktîk Nûkler kar tîne û di her van sûcên şer bi rengekî berdewam dike. Dirûtî û bê axlaqiyek di aliyên van dewlet û hêzan da tê jıyan kirin. Dewlletên sereke û yekîtiyên wek YN,yen wek Ewrupa ruxmî van sûcan lê temaşe dikin û dibin şirîkê van hovîtiyan.

Di asta Rojava da, bi rêdayin û piştgiriya hêzên wek DYA û Rusya destpêkê Cerablus,Ezaz,jê duran ji Efrîn,Serêkaniyê û Girê Spî hate dagir kirin. Dewleta dagirker ya faşîst Dixwest ku Rojava hemî dagir bike.Hin jî ew hewesa wan ji rojevê derneketiye û derfetên xwe hebe ya hewesên xwe ên Osmanî bê teredud pêk bîne. Êrişên xwe bê navber didomîne. Rojên ku kes nayên qetil kirin an jî birîndarkirin li Rojava nînin.
Dewleta Kujer ji bo ku Kurd-Kurdistanî xwedî maf û statû nebe hemû derfetên civakê bi kar tîne û bi rêbazên xapandin û desenformasyonek gemar jê xwiya dike pêdewiyên berjewendiyê. Bi kurtasî; dewleta dagirker ya Tirk, ji bo ku bê rewatiya xwe li tevayî Kurdistanê ava bike dixwaze ku welatê me bi her rê û rêbazî vala bike.
Ji bo vê yekê ev 50'î sale ku li hember vê hovîtiya dewleta Tirk û hevkarên wê û îxanetê, PKK(Partiya Karkerên Kurdistan) têkoşîneke bi rûmet û rêzdar û bê navber dimeşîne.

Di vê çarçoveyê de,1'e Cotmehê, li navenda wezareta Karê Hundirîn li Ankara yê Gerîleyên PKK'ê, Tabûra Nemiran çalakiyek fedaî pêkanîn.
Bê guman ew çalekiye li ser dilê wan da teqînek bi bandor derxist holê û dengeyê wan xerab kir û bû sebeba hejandina pergalê.
Li ser vê yekê; dewleta Tirk bi fermî li hember Rojava Şer îlan kir. Erê dewleta kujer zêdetirî sed salaya ku li dijî gelê Kurd di nav şerekî bê yeman de ye.Lê heya neha bi vî rêbazî û li ber çavên hemû cîhanê, di asta fermiyeta dewletê de li hemberî herêmek azad-dorpêçkirî ku 5 milyon gelê Rojava îlana şer kir. Her erişan pêk tîne û bingehên jiyana gel dikirin armanç,lê îlana vê bi vî rengî nedikirin. Dewleta qirker û dagirker vê carê bi devê devşirmeyê xayîn Hakan Fîdan ew şer eşkere û ziman û erişî deskeftiyên gelên Rojava-Rojhilat û Bakurê Suryê kir.
Nexweşxane,Siloyên genim,Istasyonên ava vexwarinê,navendên kehrebêelektrîkê,Istasyonen gazê, Gomen sewaldarî,Akademiyên perwerdê,Fabrîqeyên pêdiviyên jiyanê, malên sivîlan bûne hedefê dewleta tirk.
Di vê kêliyê da navbera Hamas û dewleta Israil de şer derket.Her du hêz di erişên xwe de rêgezên mirovahiyê,qanûnên navnetewî binpêdikin.Sucên şer pêktînin û herdû alî jî bi aqil û fereste da temsîliyeteke desthilatdarî dikin û van sûcan rewa dibînin.
Dewleta dagirker û kujer ya Tirk ji sûcên giran dike û ew jî wek wana van sucan rewa dibîne.
Serokkomarê dewleta Tirk Tayip Erdogan Israil rexne dike û dibêje ka mafên mirovan binpê dike? Qala gut kirina,ceryanê,avê û astengiya nexweşxana dike û hesab dixwaze.Lê bi xwe wek dewlet zêdetir di nav wan sucan daye û durutiyek gelek xirab dilîze. Ne exlaq,ne wijdan ji vanre nemaye.Henekan xwe bi aqilê mirov dikin.Şerm nakin,fedî nakin.
Dewşirmeye xeter Hakan Fîdan ilan kir ku ew Gerileyên PKK'ê li Rojava derbasî Ankara'ya bûne.Ew behaneya erişê bû.Aloziyên wek yên Dêrezorê û êrişên li ser Minbicê û deverên wek Eyn Isa,Girê Spî, ku têk çûn û bê ancam man.Vê carê maşeyên xwe dan alyekî û rast û rast ket nav êrişan. Ew zelale û bê gumane. Lê henek kes,hizib û doralî, van rastiyan kor û kerin dizanin û bi dev û zimanê dijmin diaxifin.
Ew kes û doraliyên ku rewşê dinirxînin ne ku nezanin. Wan di aliyê aqil û ferasetê de, mîtingeriya dagirkerên Tirk qebûl kiriye û xwe wek karmendên dewleta Tirk dibînin.
Wek tê zanîn li Rojhilata Navîn polîtîkaya global tên meşandin û şerê cîhanê yê 3 yemîn têye jiyankirin û erişên dewleta Tirk yê hovane di nav vê pirojeyê de pêktên.
Pirsgirêkên li herêmê yên sereke ya Kurd û Filistînê ye.Eger ku dewletên Global-kurewî bixwazin ku çareser bikin ne zahmete û wê pêk bînin. Lê berjewendiyên wan ên cuda naxwazin ku aramî yekemîn di Rojhilata Navînde û cîhanê şîn bibe. Bo vê her tevlîhevî çê dikin û nakokiyan gur dikin û kûrtir dikin û en nû diçin-ava dikin.
Li ser van Rastiyan derketiyê holê ku, pergala Kurewî Kapitalîzim sebeba van pirsgirêkane ku herêm û mirovatî bi giştî di navde dijî.
Wê demê pêwîste ku her xwedî wijdan û xwedî marîfet bizane ku ên ku dibin sebeba nakokiyan û aloziyan nabin rayedarên çareseriyê. Ji bo vê pêwîste ku ew jî werin teşîr kirin.

Pirsgirêka Kurd dîrokîye û tenê ne girêdayî parçeyekî Kurdistanê ye.Yên ku xwe xwedî Parçeyan dibînin û ji bo berjewendiyên xwe ên gemar û mîtinger û dagirkerên Kurdistanê re hevkariyê dikin ên wek PDK-ENKS pêwîste ku baş werin nasandin û teşîr kirin.Welatiyên me ên ku di nav hest û seknên welatparêziyêde dijîn lê hîn ew xeta qirêj û hişmendî nas nekirine ji bona ku were zelal kirin. Li dijî kevneperestî û xiyanetê tekoşînek bîrdozî,politîk û bi bandor were meşandin.
Her welatparêzek,her Kurdperwerek,her hemwelatiyekî Kurdistan vê wekî erkekî sereke bigre dest û bi wî rengî bijî û tevbigere.
Rastiyek din ew e ku,li hember êrişên ku dagirkeriya dewleta Tirk xeta radîkal ya Şoreşgerî ewleye. Raste bersiva herî derbasdar û bingehîn di inşaya pergalê de serkeftin e. Lê belê,di asta Rojava/Bakur û Rojhilatê Suriyeye de xeta Şerê Gelê Şoreşgerî pêwîste ku lez bê esas girtin û parastinek çalak bikeve meryetê.
Eriş bê bersiv nemînin.Dijî hovîtiya dewleta dagirker tekoşîn bi her rêbazî mafdar û rewaye û
daxwaz, helwest û hestên gel li ser van rastiyan xwe nîşan didin.



## Şûjina di çavê xwe de nabîne, derziya di çavê xelkê de dibîne

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk a dagirker bi dijwarî êrişî binesaziya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Stasyonên eltrîkê, avê, dibistan, nexweşxane, kargeh û cihên bi jiyana gel ve girêdayî bombebaran û topbaran dike. Êrişên wan hîn jî bê navber dewam dike. Li gorî peymana Cinêv-4 a sala 1949'an ku dewleta Tirk jî di nav de 196 welatên cîhanê imze kiriye, di şeran de divê sivîl û saziyên jiyanî parastî bin, kesên xalên peyamanê binpê bike, sûcên şer dike.
Tişta dewleta Tirk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û armancgirtina sivîlan sûcê şer ê û divê Neteweyên Yekbûyî (NY) hesab ji sûcdarên sûcên şer dike, bixwaze. Lê di rastiyê de tişt dibe, dewleta Tirk hemû sûcan bêyî hesab ji NY'yî û saziyên wê bike, pêk tîne. Li ber çavên her kesî Sûcên li dijî mafê mirovan pêk tîne û dixwaze bi îdayên ji rastiyê dûr wekî xwe diparêze nîşan dide.
Bê dengiya civaka navdewletî û NY'yî jî hînê zemîna wan a êrişan zêdetir vedike, ji lewra mirov dikare bi hêsanî bêje ew jî şirîkê êrişan in. Çima hemû welatên Rojavayî tevî metirsî û xeteriya dewleta Tirk û sîstema Erdogan a çetewarî baş dizanin, bê deng dimînin?.
Mane erka wan welatane, xwedî li peymanên xwe derkevin û rê li ber sûcên dewleta Tirk bigirin. Lê mixabin bê bextî û girêdana bi berjewendiyan ku ji aliyê wan welatan ve wan kor, ker û lal kiriye. Wan li ser esasê berjewendiyan çavên xwe ji dewleta Tirk re digrin. Ezmanê Bakur û Rojhilatê Sûriyayê ji wan re vekirine. Ew jî bi kêfa xwe êrişî gelê herêmê dikin. Di heman demê de dewleta Tirk jî rê ji Rûsiya û hikûmeta Şamê re vekiriye, Idlibê bombebaran û topbaran bike. Ev bê bextiya herdû aliyan a li dijî gelê Sûriyê bi itîfaq û planên qirêj pêk tên.
Ne tesadife êrişî Idlib, Heleb û herêmên din ê dagirkirî di heman dema êrişên li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê dikin. Ew li gorî plan û siyasetên xwe yên bazirganiyê pêk tînin. Di encama planê xwe yên dijberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ew êriş li dijî gelê herêmê pêk anîn. Armanca wan a sereke têkbirina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye.
Di vê mijarê de Dewleta Tirk, Rûsiya, Îran û Hikûmeta Şamê lihev kirine. Ji ber di ezmûna salan a şoreşa Sûriyê de isbat bûye ku xweserî tekane riya çareseriya aloziya li Sûriyê ye û tenê ew dikare gelê herêmê bighîne hev. Ew dibînin hêzên QSD'ê xwe ji bo bersivdayîna êrişan baş amade kiriye, ji lewra êrişî binesazî û zemîna jiyana herêmê dikin.
Dema di şerê Israîl û Hemasê de Erdogan daxuyaniyên bi kirinê xwe re nakok in dide û xwe wekî kesên herî mirov hez nîşan dide. Dibêje ku tişta Israîl dike li dijî peymanên navdewletî ye. Berê pêşiyên me digotin "Şûjina di çavê xwe de nabîne, derziya di çavê xelkê de dibîne. Erdogan Peymanan binpê dike û dixwaze bi îda û derewên xwe xwe wekî xwediyê Xezayê nîşan bide.



# QSD'ê hêviya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye

Di 10`ê Cotmeha sala 2015'an de Hêzên Sûriya Demokratêk hate damezrandin. Bi dirêjiya 9 salan QSD'ê gelek serkeftin û guhertinên mezin di qada leşkerî û siyasî de pêkanîn. QSD'ê hîn li ser soza xwe ye û ew ji bona gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê hêviya siberojê ye.

**Berçem Silêman/ Qamişlo**



Hêzên Sûriya Demokratîk di 10'ê Cotmeha sala 2015'an de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate avakirin û ragihandin. Hêzên ku cihê xwe di nav QSD'ê de digrin bi daxuyaniyekê ji ragihandinê re xwe dan nasîn û gotin: "Em hêzeke leşkerî, niştimanî û yekgirtî ya hemû gelê Sûriye ne ku Ereb, Kurd, Suryan û hemû pêkhateyên din jî cihê xwe di nav de digrin."
Hêzên Sûriya Demokratîk kontrola xwe li ser herêmên berfireh ên Sûriyeyê bi dirêjahiya 35 hezar kîlometre ji qada Sûriyeyê ya giştî ku 185,000 kîlometre çargoşe berfireh dibe û hejmara hêzên QSD'ê zêdeyî 45 hezar şervanî ye.

### Hêzên leşkerî yên ku cihê xwe di nava QSD'ê de digrin

Hêzên leşkerî yên ku cihê xwe di nava QSD'ê de digrin jî ev in."Hevbendiya Erebî ya Sûriyê, Artêşa Şoreşgeran, Odeya Çalakiyan a Volkana Firatê, Hêzên El-Senedîd, Meclîsa Leşkerî ya Suryaniyan, Yekîneyên Parastina Gel(YPG) û Yekîneyên Parastina Jinê(YPJ). Yekîneyên Parastina Gel û Yekîneyên Parastina Jin şerên dijwar li dijî çeteyên DAIŞ'ê, dane meşandin û baweriya gel qezenckirin û ew mîna hêzên sereke yên ku cihê xwe di nava QSD'ê de digrin. Destpêka şikandina çeteyên DAIŞ'ê û şerê herî giran jî bi pêngava rizgarkirina bajarê Kobanê destpêkir.

### Navê Meclisên ku hatine avakirin.

1 - Meclîsa Leşkerî ya Minbicê.
2- meclisê Girê Spî yê leşkerî.
3 - Meclîsa Leşkerî ya Serêkaniyê
4 - Meclîsa Leşkerî ya Reqayê.
5 - Meclîsa Leşkerî ya Dêrezorê.
6 - Encumena Tepqa ya Leşkerî.
7- Meclisa Leşkerî ya Cerabulus.
8- Meclîsa Hêzên El-Senadîd
9- Meclisa leşkerî ya Qamişlo.


### Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk

Ji 15 endaman pêk tê ku di nav wan de fermandarê giştî û 2 alîkarên wî hene, endamên Fermandariya Giştî ji nav endamên Meclîsa Leşkerî tên hilbijartin û nûnertiya jinan misoger dike.

### Hemleyên Hêzên Sûriya Demokratîk

Di nav hemleyên herî girîng ên ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk ji destpêka damezrandina xwe heta îro dane destpêkirin ev in:
1- Hemleya rizgarkirina Holê, yekemîn hemleya leşkerî bû ku Hêzên Sûriya Demokratîk dest pê kiribû.
2- Hemleya Xezeba Firatê ya rizgarkirina bajarê Reqa û gundewarê wê
3-Hemleya Xezeba Xabûrê, Hêzên Sûriya Demokratîk di Sibata 2016`an de hemleyeke nû di bin navê "Xezeba Xabûrê" de ji bo rizgarkirina bajarokê "El-Şedadê" û başûrê wê da destpêkirin. Gundê bajarê Hesekê, armanca sereke ya hemleya rizgarkirina bajarê stratejîk "El-Şeddadê bû".
4- Hemleya rizgarkirina Minbicê û gundewarên wê, Operasyona "Destgirkirina Firatê"çend mehan hat rawestandin, Hêzên Sûriya Demokratîk amadekariya operasyoneke mezin ji bo rizgarkirina bajarê Reqê ji çeteyên DAIŞ'ê dikir. Ji ber wê yekê di 2'ê Hezîrana 2015`an de dest bi operasyona rizgarkirina bajarê Minbicê hate kirin. 25ê Kanûna Pêşîn a sala 2015`an pêngava rizgarkirina bajarê Minbicê li ser erdê hate destpêkirin. Yekem bajarokê ku di hemleya rizgarkirina Minbicê û gundewarên wê de hat rizgarkirin, bajarokê "Ebû Felfel" bi qasî 50 km li başûrê rojhilat bû. Di 15'ê Tebaxa 2016'an de rizgarkirina tevahî bajarê Minbicê hate ragihandin.
Hêzên Sûriya Demoqratîk îsbat kir ku ew hêza herî bi displîn û bi bandor e, li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet û li ser asta Sûrî jî bi giştî ev yek hate isbat kirin. QSD'ê ezmûnên leşkerî yên mezin derbas kirin, ku tê de karîbû serkeftinên ku hatine piştrastkirin bi dest bixin û bandoreke erênî li ser Sûriyê çêbike. Ji ber ku QSD'ê di hemû şer, pêngav û ezmûnên ku têre derbasbûyî û li hemberî hemû hêzên ku dixwestin serweriya Bakur û Rojhilatê Sûriyê têxin destê xwe bi ser ket û paweriya gel û navnetewî qezenckir. Di serî de hêzên hevpeymanî û gelek hêzên heremî jî xwestin ku QSD'ê bi wan re bikeve nava hevpeymanên leşkerî
Hêzên Sûriya Demukratîk (QSD'ê) xwediyê ezmûnên leşkerî yê mezine û mîna hêza herî bi dispilîn û çalak li ser qada Sûriyê giştî xwe isbat kirî ye. QSD'ê û bi riya pêngavên ku tevîbûna xwe jêre çêkirine û serkeftinên ku bi destê xwe ve anîne bandoreke erênî li seranserî Sûriyê û cîhanê tevahî daye çêkirin. Ji ber vê yekê gelek hêzên heremî û navnetewî xwestin ku bi QSD'ê re bikevin nava hevpeymanên leşkerî û sûdê ji ezmûnên QSD'ê bigrin.
Rêwîtiya QSD'ê bi dawî nebûye û hîn berdewame û roj bi roj QSD'ê mîna guloka berfê mezin dibe û bi hêztir dibe. Herçiqasî zehmetî, asteng û planên mezin jî li pêşiya QSD'ê hebin, lê ew bi biryare ku gel û axa xwe biparêze û li hemberî hemû hêzên ku dixwazin axa Sûriyê dagirbikin li berxwebide û bi serbikeve. Ji destpêka şoreşê û heyanî îro li hemberî dagirkeriya tirk û çeteyên DAIŞ'ê û ji bona parastina gel û xaka welat zêdetirî 12 hezar şehîd û 20 hezar birîndar hatine dayîn.
Hêzên Sûriya Demukratîk(QSD'ê) ji bona siberoja Sûriyê tevahî tamînata demukrasî, wekhevî û azadiyê ye. Ji ber ku ew di nava xwe de hemû pêkhateyên Sûriyê dihewîne û bi felsefeya azadiyê û li ser bingehê netewa demukratîk tevdigere û bi hişmendiyeke nûjen û serwextê demê tevdigere. Herçiqasî dijminê li hemberî me xwedî teknîk û çekên pêşketîbe, hêzên QSD'ê jî xwedî vîn, bawerî û hunera pispûriya şer û ezmûna bi salan e. Herweha gelekî qehreman û xwedî bawerî, vîn û cesaret jî li pişt QSD'ê heye. Hêzên Sûriya Demukratîk bi desteka gelê xwe yê berxwedêr wê li hemberî dagirkeriyê li ber xwebide û wê hertim serkeftinê bi destê xwe ve bîne.

## Erdogan, Filîstîn û her tişt ji bo desthilata xwe bikaranîn



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk got kesên çalakiya Enqerê kirine di sînorê Sûriyê re derbasî Tirkiyê bûne û di 5'ê Cotmehê de bi balefiran êrişek giran li ser Rojava çêkir. Beriya van êrişan wezîrên Tirk armancên xwe bi vî awayî anîn ziman; armanca me tevahî çavkaniyên binerd û ser erd in. Êrişên wan jî tam li gorî vê çêbûn, çavkaniyên gaz û petrolê, santralên elektirîkê, dapoyên genim û nexweşxane, cihên hilberînê armanc girtin. Heman demê de nêzî 50 mirov qetil kirin. Piraniya kesên jiyana xwe ji dest dan sivîl bûn. Diyar e ku ev ne leşkerî bûn. Çavkaniya jiyana gel ava dikirin. Di şer de jî êrişîkirina sivîl û çavkaniya jiyanê sûc e.
Lê ji bo kesên dewleta Tirk rêve dibin ev komkujî, tunekirina nîjadî û dijminahiya li dijî tevahiya gelekî ne sûc in û mafek wan ê xwezayî ye. Wiha nêz dibin û cîhanê jî wiha pejirandiye. Herêmên hatine bombekirin ji xwe di bin dorpêçê de ne. Rasterast ji dorpêça li ser Sûriyê bandor dibin. Nirxek pereyê Sûriyê nemaye. Hertim dolar bilind dibe. Ev jî tê wateya hejarbûna gel. Mirov ji bo bijîn kedek mezin didin. Dewleta Tirk jî tê û çavkaniyên heyî jî tune dike. Ev tê wateya valakirina tevahî herêmê û koçberkirina gel. Di cewherê de armanca van kiryaran tunekirina nîjadî, qirkirin û sûc e.
Erdoganê faşîst li ber çavê cîhanê, di bin navê terorê de gelekî tune dike û planên mişextinê pêk tîne. Çavkaniyên jiyanê yên ku hatine tunekirin çawa dikeve nava têkoşîna li dijî terorê? Ma tenê terorîst van çavkaniyan bikar tînin? Ma pêwîstiya gel bi elektirîk, gaz û avê tune ye? Cihê hatine lêxistin li ber pozê DYE û hêzên koalîsyonê ne. Ev bi salane ew bi xwe jî van cihan dibînin, dizanin ku ev cih çawa xizmeta gel dikim. Li gel vê jî devê xwe venekirin, ker û lal man.
Me hertim got, heta DYE û Rûsya erê nekin Tirkiye nikare êrişî Sûriyê bike. Ji ber ku parastina qada hewayî ya herêmê van herdû hêzan daye ser milê xwe. Rayedarên DYE'yê carnan bi dengekî nizim dibêjin, bila alî li gorî hevpeymana 17'ê Cotmeha 2019'an tev bigerin. Gelo di vê hevpeymanê de hertim qetilkirina mirovan û komkujiyên Tirkiyê nivîsîne? Gelo di vê hevpeymanê de ji Til Rifat heta Dêrikê lêxistina çavkaniyên jiyana gel heye? Hevpeymanek wiha tune ye. Ji derveyî vê bang li aliyan kirin jî jirêderketinek din e. Rêveberiya Xweser dewleta Tirk weke dijmin îlan nekiriye û li hemberî wî şer nedaye destpêkirin. Ji sînorê Sûriyê tu êriş li dijî Tirkiyê nehatine kirin. Ev êriş bi tevahî yekalî ne.
Erdogan û Baxçeliyê faşîst DYE yê jî bi piştgiriya bi PKK'ê sûcdar dikin. Li hemberî DYE'yê şerekî derûnî didin meşandin. Zextê li DYE yê dikin ku têkiliyên xwe yên bi YPG'ê re qut bike. Halbûkî DYE destûr nede ew nikarin bi SÎHA'yên xwe mirovan qetil bikin. Nikarin evqas balefiran rakin û çavkaniyên jiyanê ziwa bikin. Dema Erdogan xwe li hemberî Bîden zirtikan û got em DYE'yê guhdar nakin û emê êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin, sefîrekî karbes ê Tirk di TV'yê de rastiya ku em hertim tînin ziman got, êrişên dewleta Tirk qasî ku DYE destûr dide çêdibin.
Bi fermana Erdogan di 5'ê Cotmehê de êrişên li ser herêmên xweser destpê kirin. Balkêşe Hemasê jî di 7'ê Cotmehê de êrişî Îsraîlê kir. Hemasê ev êriş tomar kirin û bi armanca propogandayê weşand. Cîhanê kuştina jin û sivîlan di kamerayên wan de temaşe kir. Ji ber ku êriş mezin bû Îsraîl hejand. Ne Îsraîlê ne jî hêzeke din ne li benda êrişek wiha bû û îhtimal nedida. Êrişên Hemasê yê li dijî Îsraîlê bi lez ketin rojeva cîhanê. Îsraîlê dest bi êrişên dijber kir. Gazze bi balefir, tang û topan bê navber rastî êrişan hat.
Erdoganê ku fermana tunekirina av, elektirîk û çavkaniyên petrola Kurdan dabû vê carê jî li aliyê din zivirî! Li bîr anî ku exlaqek ê şer jî heye. Got, "nabe Îsraîl êrişî cihê jiyanê, sivîlan, xwirek û avê bike. Ma dibe dorpêçê dane ser sivîlan? Ev di zagonên şer de tune ne û li dijî mafê mirovan in". Heman demê de got, karê DYE'yê li Derya Spî çi ye, çima van keşitiyan tîne û bertek nîşan da. Wisa xuyaye Erdogan dibêje qey Îsraîl jî weke Kurdan bê xwedî ye! Erdogan gelek ked di ber Hemas û Îxwaniyên din de da û ew pişpişandin. Niha jî ketiye tengasiyê. Dixwaze karesatên ku Filistînî dijîn ji xwe re bike amûra propogandayê. Erdoganê ku di nava xwe de edaletê pêk nayîne, Kurdan qetil dike, di cîhanê de tu giraniya wî çênabe.
Di roja Înê de hinek koman li Amedê kiryarên li ser gelê Filistînê protesto kirin. Piraniya van jî Kurd bûn. Çi rewşek balkêş û seknek bêkesayet e. Çima di bin navê ol û piştgiriyê de xwedî li gelê xwe, li Kurdan dernakevin? Beriya êrişa Îsraîlê ma Erdogan heman tişt li Rojava nekir? Ma di Îslamê û mirovahiyê de evqas tirsonekî û dirûtî heye?



## Dewletparêzî û şerê li Rojhilata Navîn…

**Farûk Sakik**

Şerê Ermenistan û Azerbêcanê hîn bi dawî nebibû, bi şerê Hamas û Îsraîlê re, şerê cîhanê yê sêyem derbasî qonaxeke nû bû. Eniyeke nû li Xeza vebû.
Lê beriya vî şerî, êrişên dewleta Tirk a dagirker li Rojava bê navber dewam dikir. Em ji vê derê dest pê bikin.
Di êrişên hewayî yên dewleta Tirk ên bi ser Rojava de, hemû pergala binesazî û xizmetguzarî ya herêmê hate hedefgirtin. Bendav, santralên elektrîkê, bîrên petrolê, embarên xwarinê û gelek tesîsên din bi balafirên bombebarkirî hatin bombekirin. Bi dehan kes di van êrişan de jiyana xwe ji dest dan. Dema ku li vê erdnîgariyê mirovahî dihat bombekirin, cîhan bêdeng bû.
Rojek hat me dît serokê Amerîkayê Joe Biden diyar kir ku 'dewleta Tirk li dijî Rojava, binesazî û xizmetguzariya herêmê hedef girtiye û piştre jî êrişî van deveran kiriye. Em vê yeke wekî tehdîtek li dijî ewlekariya Amerîka dibînin.'
Belê kurd dimirin wî hişyarî dida Tirkiyê û behsa tehdîta ewlekariya welatê xwe dikir. Ji bîr kir û negot ku di encama wan êrişan de çiqas însan şehîd bûn. Behs nekir ku li wê derê gel bi talûkeyek çawa re rû bi rû maye. Mirov difikire, gelo wî 7 roj destûr da ku Tirkiye herêmê bombebaran bike. Çima di germahiya komkujiyê de û bombebaranan de ev daxuyanî neda.
Heman Biden, ji bo şerê Hamas û Îsraîl jî digot 'mafê Îsraîl tune ye ku Xeza îşgal bike. Lê dikare Hamas û Hîzbûllah paqij bike.'
Belê ji bo Rojava çawa piştî her tişt qewimîn daxuyanî da, ji bo Xeza jî piştî koçberî û kuştin çêbûn daxuyanî da. Dewleta Tirk a dagirker hat îşgal kir. Kuşt û tune kir. Te çima negot 'Ey Turkiye! mafê te tune, bikevî Rojava. Rojava ji bo te tu carî nebûye tehdît. Ev êrişên te sûcên şer e.'
Rast e, di encama êrişên Hamas de û êrişên Îsraîl de êşên mezin çêbûn. Gelek însan ji ber sedemê siyaseta netewe dewletê de jiyana xwe ji destdan û ji axa xwe koçber bûn.
Di serî de Tirkiye durûtiya dewletan di vî şerî de derket holê. Hin dewlet li gorî berjewendiyên dewleta xwe, piştgirî dane Hamas û hin dewletan jî piştgirî dane Îsraîlê. Piştgirî dane netewe dewletan (Îsraîl û Filîstîn). Gel û mirovên li wê derê(Îsraîl û Xeza) di çi rewşê de bûn, ne xema wan bû.
Lê xema KCK'ê bû û digot: "Pirsgirêka Filistînê ne bi rêbazên tundiyê, lê bi demokrasiyê û bi naskirina mafê gelê Filistînê çareser dibe."
Em ê behsa gotinên Erdogan ên ku ji bo Xeza danî ziman nekin. Dema ku diaxivî wî ji xwe bawer nedikir.
Dewleta Tirk û Erdogan hetanî roja me ji dil û rast nêzî pirsgirêka Filistînê nebûn. Bi temamî weke mijareke ku bide şixulandin didîtin. Erdogan bi vê têgihiştinê nêzî pirsgirêka Filistînê û gelê Filistînê dibû û hewl dida ji bo bazirganiyê welatê xwe bi kar bîne. Dîsa bi vê nêzikatiya xwe, hewl dida vê pirsgirêkê di polîtîkayên xwe yên qirkirina Kurdan de, wek bazariyek bi kar bîne.
Tenê ji ber vê sedemê bi pirsgirêka Filistînê re eleqeder dibûn. Ne ji dil li kêleka gelê Filistînê bûn. Me nedît berî vî şerî rojek midaxleyî vê pirsgirêke bike û di çarçoveya demokratîk de çareser bike. Wek 'Reqesan' rojek bi Îsraîl re, rojek jî bi Hamas re reqs dikir.
Bûyerên li Filistîn û Îsraîlê diqewimin, girîngiya nêzîkatiya neteweya demokratîk a ku Rêber Apo ji bo çareseriya pirsgirêkên li Rojhilata Navîn destnîşan kiriye, careke din nîşan dide. Digot: Ji dîrokê heta îro çiqas zîhniyeta dewletparêzî bi pêş ketibe, pirsgirêk jî ewqas zêde bûne.
Şerê Hamas û Filistîn, êrişên dewleta dagirker parçeyek vê zîhniyetê ne.